

Mehmed Uzun

Tu

Roman

Eger meriv bixwaze ji grûbeke sosyal, ku di edetên wê de
afirandinên ronakbîran tune bin, tîp û ronakbîrekî nû biafirîne;
divê meriv ji bîr neke ku biserketin gelekî dijwar e.

Antonio Gramsci

Xorto! Te ji dîroka milletê xwe karek li ser xwe girtiye.
Ew karekî giran e. Jixwe barên giran para mêran,
para mêran barên giran in. Te ew kiriye pişta xwe û daye
kaşê çiyayên ku bi rê ve bilindtir û asêtir dibin. Herçend hildikişî
û ji deştê dûr dikevî, diwestî, lê ewçend zexm û xurt dibî.
Hawîr diguhere, tiştên nenas dibîn.

Celadet Alî Bedirxan

1

*Kêzê kêzê kêz xatûnê
Bi şimika reqreqûnê
Bi şahîra gulavdûnê
Tu bi kû derê de diçî*

Belê kêzê, dema dapîra min dest bi çîroka te dikir, weha digot. Ez jî fêr bûbûm... Bi dû dapîra xwe re min jî dest pê dikir,

*Kêzê kêzê kêz xatûnê
Bi şimika reqreqûnê

Bi şahîra gulavdûnê
Tu bi kû derê de diçî*

Pir xweş bû, kêfa min ji wê çîroka te re dihat. Ez rastiye bibêjim, min bes ji çîroka te hez dikir. Ne ji te, li min bibore, lê wisan bû. Tu ji min re hinekî bi xof dihatî. Heywaneke bi xof, gemarî û xirab. Çima tu di serê min de wisan mabûyî, ez nizanim. Ez bawer im, ji min re wisan hatibû gotin û min jî tu wisan dizanîbûyî.

Na, na tu ne wisan î, kêza delal. Tu heywaneke xweşik û bikêr î. Binihêre, tu niha li vir di vê tenêtiya min de, ji min re bûyî heval û hogir.

Hevala min, kêzê, kê dizanîbû, ez dê li vir di vî cihê tenê û tarî de rastî te bêm, te bikim mêvana xwe. Min pir jî li çîroka te guhdarî kiribû. Pîrika min, dayika min, amojin, xaltî û metikên min, bi caran çîroka te ji min re gotibûn. Min jî her lê guhdarî dikir. Bawer bike, tu carî min negot;

Na... Bes e êdî, ez vê çîrokê dizanim.

Tu carî min negot,

Na... Bes e êdî, ez ji vê çîrokê têr bûm.

Min nedigot. Ji lew re min ji çîroka te hez dikir. Na, na mekeve şikê, ez niha ji te jî hez dikim. Min niha tu ji nêzik ve dîtî û nas kirî. Tu ne ew kêz î ku min di serê xwe de xeyal kiribû. Tu kêzikeke delal û rind î.

Mîna niha tê bîra min, dema min di navbera qûç û berçînên rezên me de lotik didan xwe û min di navbera mêwên rez de dilîst, çîroka te her li ser zimanê min bû. Min hem ji xwe re dilîst û hem jî min digot.

Kêzê kêzê kêz xatûnê

Bi şimika reqreqûnê

Bi şahîra gulavdûnê

Na, nabe... niha tu dê bi derekê de neçî. Ez te bernadim. Tu mêvana min î. Ev çûyina te di çîrokê de ye. Niha tu li vir î. Ne dapîra min, ne dayika min, ne rez, ne qûç, ne lîstik û ne jî xweşiyên wan man. Em niha li vir in. Tenê, bêkes, bêçare. Di vê gûla hanê de em bi serê xwe ne. Wan em girtin û avêtin vê derê. Avêtin paş heft deriyên hesinî. Xistin bin qeyd û zincîran.

Rast, tu ji kîjan warî hatî, ketî vir?

De, dev jê berde... Ez nikarim li ser vê yekê bifikirim. Êşên min, janên laşê min bernadin ez bifikirim. Tu sax bî. Ev, alîkariyeke mezin e ji min re. Ez li vir nikarim zêde qedrê te bigirim. Ez çawan bikim? Axir, tu dibînî, ez di çi rewşê de me.

Lê em dikarin bi hev re bipeyivin. Ji hev tiştinan bipirsin. Serpêhatiyên xwe ji hev re bibêjin, behsa rewşa xwe bikin. Belê, belê, ez têdigihêm, tu nikarî bipeyivî. Lê tiştek nabe, ez dikarim bipeyivim û tu guhdarî bikî.

Na na... mereve. Ez te bernadim. Mereve keçê. Bi kû de? Tu dixwazî bi kû derê de herî? Na, çûyin tune. Ez te bernadim. Tu dê li vir, li ba min bî û li min guhdarî bikî.

Tu çawan wisan difikirî? Tu ne dîl î. Ez bi xwe dîl ketime, ez ê çawan kesekî din dîl bigirim. Tu mêvana min î. Hê tu têngihîştîyî ku ez li dû hevalekê me, dixwazim bipeyivim.

Kêzê, tenêbûyin, tenêmayin dijar e. Tu çawan hîs dikî, ez nizanim, lê di vê qulika biçûk de, bê dost, bê heval, bêkesbûyin pir zehmet e. Gerçî ez fêr bûm, lê dîsan jî dijar e. Rast, ev bû roja çendan ku ez li vir im? Min bi xwe jî jî bîr ve kir. Êdî ne girîng e. Roja çendan dibe bila bibe. Ew kengî dixwazin bila hingê min derxin, eger dixwazin bila min bikujin. Kêfa wan e.

Meriv çima weha ye? Çima zû fêrî tiştan dibe? Kêzê, ez tu carî di dijarîyeke weha de nejiyabûm û min tu carî jî bawer nedikir ku ez ê bijîm. Ê dema ez bijîm, ez ê dîsan sax bimînim. Belê rast e, her derên min ji hev ketine. Lê ez sax im. Tu nabînî, ez bi te re dipeyivim û ez fêrî dijarîyên weha ji bûme...

Baş bû, pir baş bû ku tu hatî. Ez nizanim, dibe ku tu ji berê de li vê derê bûyî. Lê, îro, heta berî niha ku min tu dîtî, hîç bala min nekişandibû ku tu li vir î.

Belê, belê... Tu bi xêr hatî kêz xatûnê.